Li Tirkiyê êdî pirtûkên cuda cuda tên çapkirin. Lê gerek e hêj jî pirtir bibin. Çawa ku tiştek zêde dibe û tu bêjing dikî, tiştên hûr diçin û

yên gir û mezin dimînin, edebiyat jî wisa ye; divê ku zehf bibe, ji bo ku hemûyan bêjing bikî û bixwînî û paşê bizanî kîjan çêtir e. Ev meydan aniha diçe û tê, carinan xurt, carinan jî hêdî ye.

**Berhemên ku apê Hecî (Heciyê Cindî) bi navê xwe çap kirine, hemî ne berhevkirinên wî ne.**

**Dema ku mirov jiyan û xebatên wêjevanên kurd ên Ermenistanê dixwîne, ji Heciyê Cindî bigire û hetanî roja îroyîn, piraniya wan giranî daye daneheva zargotin û folklorê, sedemên vê yekê çi ne?**

Dema ku bolşevîk hatin, rê dan hemî neteweyan û ji wan xwestin ku danehev, berhevkirin, nivîsîn, xwendin û reweşenbîriya xwe bi zimanê xwe bikin. Di salên 30'an de ev tevger gelekî geş bû. Tîpên kurdî hatin çêkirin, rojnameyên kurdî hatin çapkirin, dibistanên kurdî vebûn û rewşenbîrên kurdan

jî dest pê kir. Li Azerbîcanê jî berhevkirin û rewşenbîriya kurdî dest pê bû, lê li bal me (Ermenistan) xurttir bû. Ermenistan bû bigeha kurdên Azerbîcan û Gurcistanê jî. Lê dixwazim tiştekî bibêjim: Berhemên ku apê Hecî (Heciyê Cindî) bi navê xwe çap kirine, hemî ne berhevkirinên wî ne. Wê hingê ne tenê kesekî berhevkirin dikir, lê belê grûp-grûp diçûn. Grûpên ermeniyan jî hebûn, ermeniyan gelekî baş bi kurdî dizanîbû û xebateke pir baş kirin. Ermeniyekî Muksê hebû, 20 şaxên Rustemê Zal nivîsîne. Îcar grûpa ermeniyan berhevkirinên xwe radestî seksyona (beş) kurdî dikirin û sekreterê seksyonê jî apê Hecî bû. Gelek ji wan kesên ku folklor berhev kiribûn wefat kiribûn û yên mayî jî bi temenê xwe mezin bûbûn. Paşê di salên 60'î de apê Hecî ew destnivîsên di dest xwe de (yên ku di seksyonê de bi dest xistibûn) û hin tiştên din jî lê zêde kirin û bi navê xwe çap kirin.

Ermeniyê ji Muksê navê wî Pûşîkyan bû. Pûşîkyan di berhemeke ermenî de li jêrê wekî not nivîsiye ku enstîtuya wan, şaxên Rustemê Zal berhev kiriye û bi kurdî nivîsiye. Îcar paşê di salên 70'yî de apê Hecî ew şaxên Rustemê Zal bi navê xwe çap kirin. Apê Hecî bi destekî bû, îcar ez her timî şaş dimam û çavnebarî li bal min çêdibû, min digot apê Hecî bi destekî ye, ez û Ordîxanê bira em bi çar destan in û ew ji me bêhtir berhevkirinê dike! Paşê min nasî ku apê Hecî destnivîsara wî ciwanmêrî bi navê xwe çap kiriye.

**Di warê belgekirin û parastina huner û folklora kurdî de, Radyoya Êrîvanê xebateke bêhempa kir. Malbata Celîlan, çi xebat di hundirê wê radyoyê de kir?**

Dema Şerê Cîhanî yê Duyemîn dest pê bû, welatî û rewşenbîrên hemî komarên Sovyetê çûn leşkeriyê ji bo ku şer bikin. Bavê min (Casimê Celîl) berê li leşkeriyê derb xwaribû û 3 parsûyên pişta wî şikestibûn, ji ber vê hindê ew di Şerê Cîhanî yê Duyemîn de neçû leşkeriyê. Lê bavê min wê çaxê xwendina bilind a mafnasiyê bi dawî kiribû û bawername wergirtibû, her wiha çapemenî jî xwendibû. Îcar di dema şer de bavê min xebata xwe di nava milet de dikir, di milê îdeologî de dixebitî. Bavê min helbestvan bû, ewî dinivîsî û hevalên wî yên ermenî jî helbestên wî werdigerandin zimanê ermenî û çap dikirin. Bavê min di sala 1954'an de berhevokeke xwe ya helbestan bi navê "Elegez" çap kir. Paşê ermeniyan jî ew berhevok wergerand. Êdî wê berhevokê deng veda û xelkê zanî ku helbestvanên kurdan jî hene. Îcar Ermenistanê çend biryar ji bo kurdan sitandin; yek jê ew bû ku rojnameya Rya Teze bi birêvebiriya Mîroyê Esed careke din weşana xwe bidomîne, ya duyan jî ku Radyoya Êrîvanê bi serokatiya bavê min (Casimê Celîl) were vekirin. Ev biryar di dawiya 1953'yan de cî bi cî bû. Berî ku Mosko pereyan bihinêre, bavê min ji bo radyoyê berhevkirin dikir û Ordîxanê bira jî di warê wergerê de alîkariya wî dikir. Di sala 1955'ê de destek û pere ji Moskoyê hatin û xebata radyoyê bi awayekî fermî dest pê bû. Careke din Ordîxan bê pere alîkarî dikir, lê di sala 1957'ê de ji bo xwendina xwe çû Leningradê.

**Birayê Xelîlê Çaçan wê demê li gund bû, li gund îmzeyên gundî û welatiyan berhev dike û dixe wekî raporeke nerazîbûnê li hember xebata Casimê Celîl û bi alîkariya mirovekî hildide Moskoyê..**

**Lê Eznîva Reşîd û Xelîlê Çaçan kengê hatin?**

Di 57'an de dema ku Ordîxan çû, êdî bavê min xebatkarekî dixwaze û wê demê (di 1957'an de) Xelîlê Çaçan tîne radyoyê. Ez mirovekî dîroknas im û her tişta ku dibêjim dokumentên wê li nik hene. Aniha daxwaznameya Xelîlê Çaçan a ji bo tevlîbûna radyoyê li nik min heye; kaxeza ku tê de nivîsiye ez bêkar im û berê min çi xebat kiriye, di dest min de ye. Wê demê radyo li jêr kontrola Wezareta Çandê ya Ermenistanê bû û ji ber ku bavê min di xebata xwe de pir çalak bû, Wezareta Çandê sipasnameyek diyarî wî kir. Di heman salê de hin kes raporekê bi bavê min hildidin Moskoyê û tê de dinivîsin ku Casimê Celîl siyaseta partiyê baş nameşîne. Birayê Xelîlê Çaçan wê demê li gund bû, li gund îmzeyên gundî û welatiyan berhev dike û dixe wekî raporeke nerazîbûnê li hember xebata Casimê Celîl û bi alîkariya mirovekî hildide Moskoyê.. Di nîvê sala 1958'an de siyaset û serokatiya radyoyê radestî Xelîlê Çaçan kirin û bavê min bû Berpirsyarê Beşê Edebiyat û Muzîkayê.

Dema ku Xelîlê Çaçan hat radyoyê pişta wî gelekî germ bû, her du birayên wî "Bayloz" û "Celîl" di artêşê de payebilind bûn.

Bavê min hunermendên Mêrdîn û Bişêrîkê tanîn û dengê wan qeyd dikir. Min bi xwe jî wê demê dest bi danehev û berhevkirina folklorê kiriye. Min li arşîva xwe nihêrî, lênûskeke min a biçûk heye, ve-digere sala 1955'an. Bavê min di sala 1963'yan de dest ji xebata radyoyê berda. Nûrê du salan xebitî û çû bixwîne, Tîtal jî du salan xebitî û çû karê partiyê. Di 1967'an de Cemîla Celîl cihê xwe di radyoyê de girt û bû Berpirsyara Muzîka Kurdî. Bavê min di radyoyê de 700 sitran civandibûn. Cemîlayê ji 1967'an hetanî 2002'yan xebata xwe domand û 1700 sitran civandin. Jina min bi xwe jî "Gulîzara Casim" bîst salan di radyoyê de bêjerî kiriye. Ez berpirsyarê van gotinan im.

**Ji bona kurdên Sûriyeyê ez ê çavên xwe derxim û bêxim bin lingên wan.**

**Di van kêliyan de gelek guhertinên berbiçav li Rojavayê Kurdistanê dibin. Tu çawa li vê rewşê dinihêrî û ji bo demên bê çi pêşbîniyên te hene?**

Bingeha her tiştên erênî: diyaloga di nav hev de û hevgirtin e. Hîn bin çawa danûsitandinê bi hev re bikin; ne ku êrîşî hev bikin û li hember hev bêhurmetiyê bikin. Xaleke ku hûn der barê wê de hemnerîn bin, li ser wê li hev bikin û gaveke hevbeş biavêjin. Hev binasin, bila çûn û hatin di navbera we de hebe. Xelk bi me dikene, tu li kû derê bibêjî doza kurdî, xelk kenê xwe dike. Ji bona kurdên Sûriyeyê ez ê çavên xwe derxim û bêxim bin lingên wan. Hûn hemî baş in, lê hema bifikirin çawa hûn ê bi hev re bijîn. Her kes li ser bîr û baweriya xwe, lê zererê negihînin hev. Cihên tûj negirin destên xwe, cihên nerm bigirin ber sîngên xwe.

**Hevpeyvîna me bi dawî bû, careke din sipasiya cenabê te dikim.**

Ez dixwazim hêj ez sax im, bibînim ku Rojavayê Kurdistanê wekî rewşa ku min dîtî û hêj baştir be. Her bijî, sipas dikim.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

## Serpêhatî

### Ez Hîn li Şekala Xwe Digerim

**Dildarê Mîdî**

Dibêjin rojekê ji rojan Mîrê Rewandizê hat bajarê Cizîrê, li Mîrê Botan bû mîvan. Piştî ku kêfxweşiya xwe ji hevûdin re anîn zimên, xwarina xwe xwarin û dest bi henek û tinazan kirin. Dibêjin ku xulamekî Mîrê Botan hebû, gelekî sivik û zîrek bû. Mîrê Botan xwest ku zîrekiya xulêm nîşanî Mîrê Rewandizê bide. Rabû Mîr bang li xulamê xwe kir:

- Elo! Kurê min rabe biçe nav rez, selikek tiriyê nû ji me re bîne û were .

Elo got:

- Belê mîrê min, li ser çavan.

Dibêjin çawa ku Elo rabû ser xwe, Mîr jî bi rabûna wî re wiha axivî:

- Elo rabû ser xwe, Elo giha devê derî, Elo da rê, Elo giha ber çêm, Elo giha qelêç, Elo giha sênca rez, Elo kete nav rez, Elo dest bi jêkirina tirî kir… ji mêweya pêşîn, ji ya din, ji ya dîtir; Elo selika xwe dagirt, Elo zivirî, vegeriya, giha sênca rez, giha qelêç, giha çêm, giha ser rê, giha devê derî. Elo kurê min te tirî anî?

Bi gotina Mîr re, Elo got:

- Belê mîrê min, va ye min tiriyê nû ji we re anî.

Dibêjin tevaya civatê li selikê nihêrî û dîtin ku rast e tiriyê Elo nû ji mêweyê bûye.

Mîrê Rewandizê ji sivikbûn û zîrekiya Elo matmayî ma.

Piştî demeke dirêj, Mîrê Botan jî li Mîrê Rewandizê bû mêvan. Bê guman ewî jî rûmeteke bilind ji Mîrê Botan re girt. Piştî ku şevbuhêrka xwe bi nêvî kirin, Mîrê Rewandizê jî bang li xulamekî xwe kir:

- Hemo kurê min ez dixwazim tu herî nav rez ji me re selikek tiriyê nû bîne û bi lez vegerî .

Hemo got:

- Belê mîrê min, ser her du çavan.

Hemo rabû ser xwe û mîr jî dest bi axaftina xwe kir :

- Hemo rabû ser xwe, Hemo şekala xwe li xwe kir, Hemo giha devê derî, Hemo da rê, Hemo giha bestê, Hemo giha sênca rez, Hemo kete nav rez, Hemo dest bi jêkirina tirî kir, ji mêweya pêşîn, ji ya din, ji ya dîtir… Hemo selika xwe dagirt, Hemo vegeriya, Hemo giha sênca rez, Hemo giha bestê, da rê, giha devê derî. Hemo kurê min te tiriyê nû ji me re anî?

Hemo got:

- Na bi Xwedê ezbenî; ez hîn li şekala xwe digerim.

**Gotarên ku tên weşandin, nerînên xudanên xwe ne.**

# Bang Bo Romantîkiyê

## Nameya Sêyem: Narvîn

**AZAD -A-Z-X.**

Berî narvîna yekem, serxwezayê (Metaphysic) jiyana serxwezayê (Metaphysic life) heye. Di serxwezayê de, afrînerê sermedî heye, ew jî Xweda ye. Ew xwezaya sermedî, ne destpêk û pêşî heye, ne jî dawîn û dûmahî heye. Ez nizanim û nikarim li serxwezayê, şîrove bikim, ka narvîn rû didin yan na. Di baweriya min de, bîr û hişên mirovan zivêr dibin, dema derbasî serxwezayê (Metaphysic) dibin. Ji ber ku jiyana serxwezayê, ji hêz û şiyanên mirovan mezintir û bêhempatir e.

Ev jiyana binxwezayê (Under Metaphysic) her tişt girêdayî li ser demê ye, dem dibûre, dem bê rawestan e, dem çirke ye, derbasî xulekan dibe, xulek dibin kêlîk. Kêlîk dibin demjimêr, demjimêr pir dibin, dibin roj û şev dibin meh, sal û çerx... Ev jiyana em tê de, di hundirê gerdûnê de ye.

Cîhan hebûna heyber û hemû tiştên şênber û razber e. Dîroka mirovan ji gelek bûyeran saz bûye. Dem û çaxên berî dîrokê heye. Piştî dîrokê, gelek bûyerên dîrokî hene, tê zanîn ku ne bi vîn û xwestina mirovan dibin narvîn.. Nimûne: Wekî dagirkirina Kurdistanê, ji bal dijmin ve. Navlêkirina zarokan, ol û ayîna mirovan. Bobelatên sirûştî, wekî: bomelerz û teqîna volqanan, lehî û bahozan...

Narvîna yekem: Dema her tişt rû didin, ne bi vîn, ji ber xwe ve saz dibin. Narvîna mirovan a afrîneriyê, dema mirov nûjen tên jiyanê. Anku cara yekem ji dayîk dibin. Narvîna mirovan a xwerist û xwezayî ew e ku mirov salt sade ye, bê zanîn û agahî, bê nav e. Xwezaya mirovan a destpêkê, bê guneh û sûc derbasî cîhanê dibin, ji berî dîrokê ve.

Narvîna duwem: Lê ji piştî dîrokê ve, ciyawaziyeke mirovahî heye. Hinek mirov tên jiyanê, hestnazik û dilsoz. Hinên din jî, behremend û xwedî jîrî, bîr û hiş mezin tên jiyanê. Hinên din jî çak û baş û aştîxwaz tên jiyanê. Bi demê re karên baş dikin. Hinên din jî nebaş û şerxwaz tên jiyanê. Bi demê re, sitemkariyê dikin û dibin sedemên gelek nexweşî û nearamiyan di cîhanê de.

Narvîna sêyem: Bi awayekî fîzîkî rû didin. Mîna vê piyala şûşeyî ya li ser mêzeyê (mase), dema li ser keviya mêzeyê be, dê bi rûdaneke asan bikeve û bişike. Lê dema piyala şûşeyî, li nava mêzeyê asê be, dê ti carî nekeve û neşike . Lê dema kesek hat û bi zorê destê xwe li piyalê da, piyal dê bikeve û bişike. Pirtûk û lênûs, pênûs û her tişt jî wisan. Di jiyana mirovan de, gelek tişt rû didin ne bi vîna mirovan. Lê ya baş û bibe sûde ji mirovan re ew e ku mirov haydar û amade bin, berî kêliyên ku narvîn rû bidin. Ka em ê bi çi awayî planan bi hêvîdarî ji xwe re deynin, berî ku narvînên dijwar, armanc û hêviyên me têk bibin. A baştirîn ew e ku mirov zana bin, çarenûsa xwe bibînin, bi şiyan û vîna xwe. Narvîna xwe di paşeroja xwe de deynin, ango narvîna xwe bi destên xwe biafirînin. Dema me dît ku zanîna me serdest û bilind e, narvîna me dê rast, baş û sûdar be. Lê dema kesên bîr û baweriyên wan şaş bin, bêhêvî û reşbîn bin, ji nişka ve tûşî aloziyên narvînî dibin. Ew xwe dibînin ku ketine rewşeke perîşan û bêçare de. Lê dema li azadiya xwe digerin, nikarin ji rewşa xwe ya heyî rizgar bibin. Sedem ew e, ji ber ku berî rûdana narvînê, bêhêvî bûn, reşbîn bûn, nezan bûn.

Kurd û narvîna sêyem: Ma berî narvîn Kurdistanê dorpêç bike, bi destên dijminan dagir bike, çawa bû? Bawerî heye ku kurd berî vê narvînê, xwedî şaristanî bûn. Bi zanist û baweriyên Xwedayî bûn. Ji rewişt û zanîna Zeradeşt û pirtûka wî Avesta diyar dibe. Kurdan sitemkarî li ti gelan nekiriye. Kurdan êrîşî ti welatên biyanî jî nekiriye. Bandora kurdan, bi qencî û mirovperwerî, bi alîkariya mirov û welatên hawîrdora xwe kirine. Kurd berî dagirkerên welatê xwe, mirovpewer bûn, mirovahiya wan bilind û bi rewişt bû, azad bûn. Ciyawaziyeke mezin di navbera kurdan û van dijminên kurdistanî de heye. Wiha diyar dibe ku rastiyeke berbiçav e. Piraniya kurdan bi zorê û ne bi vîna xwe bûne musilman . Ango ola islamê bûye narvîna kurdan. Islam bûye sedemên dagirkirina Kurdistanê. Hem bûye sedemên paşketin û nezanîna mirovên wê, bindestkirin û koletiya wan, kuştin û dîlkirina wan. Musilmanên desthilatdar dijminên kurdan in, islamê dikin alav, da ku êrîşî ser wan bikin, wan bikujin û malên wan talan bikin, wan dîl û bindestî xwe bikin. Ji hezar salî ve, jixwe niha dîroka dijminkariya wan, vedigere serdema xwe..

Dema mirov li rewşa xwe ya kurdî dinere, mirov xwe kurdê rastîn û dilsoz dibîne. Jiyana mirovan bê rûmet û bê azadî ye. Ev desthilatdarên ku fermanê li me dikin, dijminên me ne. Qanûn û yasayên dijminkarî li ser me danîne. Mafên me yên sirûşt û rewayî, ji me standine, mîna zanîna bi zimanê zikmakî û xwezayî yê kurdî, azadî. Nemirovahiya xwe li ser me tewzimandine. Hemî tiştên girêdayî vîn û şiyanên me yên neteweyî, bi zordariya xwe lawaz û bê hêz kirine. Nimûne: Dema em hatine vê jiyanê, me çavên xwe li vê cîhanê vekirine, me xwe bindestên dijminan dîtiye. Welatê me kirine çar parçe, her tişt ne bi vîna me saz kirine. Çi narvîn û çi dijmin!! Dijminine nijadperest, faşîst, xwînxwar û mafxwar, sitemkar, êrîşker, dagirker. Gel û welatê me bêhempa tûşî kuştin û kambaxiyê kirine. Bi sedan komkujî û malwêranî bi destên wan li welatê me çêbûne. Me kurdan jî ji ber sitemkariya wan, bêhempa xwîn rijandiye, can kiriye bi gorî welat û dozê. Helbet, tev bûne pakrewan û şehîd.

Her cara ku me azadiya xwe xwestiye, wan hemî hêza xwe bi kar aniye, da ku berxwedan û şoreşên me têk bibin. Lê nikarîbûn vîna me bişikînin. Ferman û serdestiya wan ji me re narvîn e. Vîn û berxwedana me, ji me re pîroziya dozê ye.

Lê dema ku em li welatekî biyanî yî mîna: Ewropa, Amerîka, Afrîka… bihatina jiyanê, eger zayîna me ne li welatê me bûya, wê demê zayîna me dê di bin qanûn û yasayên dadperwer û mirovahî de bûya, ne di bin destên dijminan de bûya.

Pendnameyên felsefî yên ku min nivîsîne:

1- Dema ku te xwe nas kir, tu yê narvîna xwe nas bikî. Tu yê bizanî ku narvîna te, ne bi vîna te bi te re rû daye.

2- Heger tu xwe nas nekî, tu yê ti carî narvîna xwe nas nekî.

3- A rast û durist ew e ku tu bi xwe narvîna xwe, bi raman û bîr û baweriyên xwe biafirînî, berî rûdana wê.

4- Zanîn û rewşenbîriya cûr bi cûr a mirovan, çareseriya serkeftî ye, berî rûdana narvînan.

5- Kesên reşbîn û bêhêvî, zû rû bi rûyî narvînên bobelatî dibin. Di baweriya min de, narvînên nebaş ne bi vîna Xweda ne. Narvînên baş û erênî dayîna Xweda ne.

6- Heger tu ne afrînerê narvîna xwe bî, kesên zordar û dijminên mirovahiya te dê bi kîna xwe te dîl bikin û çarenûsa te nediyar bikin.

7- Her demê li çareseriyê bigere, tu yê bi azadî bibî serwerê narvîna xwe.

8- Bi dest û ramanên dijminan, kurd û narvîn bûne hevdemên hev. Lewra kurd rû bi rûyî kuştin û kambaxiyê dibin.

9- Dema ku kurdan xwe nas dikir û piştre dijminên xwe nas kirin, dê dûv re narvîna xwe nas bikin. Kurd dê bizanin ku ev narvîn bi zorê ye, ne bi vîna wan e.

10- Dem hatiye ku kurd narvîna xwe bi berxwedana xwe, bi vîn û dilsoziya xwe di serkeftina dawî de biafirînin.

11- Ne ku bextê kurdan reş e, bextê kurdan sipî bû, dema ku mirovahiya kurdan ji ya van dijminan cuda bû. Van dijminan bi hêza kîn û dijminatiya xwe, bextê kurdan reş kiriye, çarenûsa wan tarî kiriye.

12- Narvîna her zarokekî\e kurd e; dema nûjen tê jiyanê, gelek dijminên wî pê re tên jiyanê. Zayîna zarokên kurd di bin dest û fermana dijminan de ye.

13- Bang bo azadî ji vê narvînê, piştî vê navînê jiyaneke romantîkî heye.

**RÊZIMAN**

# Venerîneke Dîrokî Li Rewşa Zimanê Kurdî 3

**Deham Ebdulfetah**

- Di navbera salên 2160-2110'ên BZ de Gotiyan desthilatiya xwe li herêma Mîzobotamyaya jêrîn kiriye û di navbera salên 1600-1200'ên BZ de Kasiyan jî li wê herêmê desthilatî kiriye. Ev her du gelên dêrîn nişteciyên Zagrosê bûn û têkiliyeke dîrokî di navbera wan û Kurdan de hebû .

Vêca reng e ku ew bandora zimanî, di wê qonaxê de bûbe. Dibe jî, ku ew bandor di rêçikên bazirganiya ku di navbera Somerî, (li başûr) û nişteciyên çiyayan (li bakûr) de bûbe.

Ji ber ku dîroknas, wê têkiliya bazirganî tekez dikin ku wê demê hebû .

- Li gora ku hatiye zanîn, Somerî jî Arî ne (Hindo-Îranî) ne. Vêca dibe ku ew bêje û gotinên ku di navbera zimanê Kurdî û yê Somerî de hevbeş in, ji wê koka Arî, di nav her du zimanan de mabin!

Li dûmahiya vê ronîkirinê em dikarin bibêjin, ev gotin ji kû hatibin û çawa bûbin hevbeş bila ew bin, lê herî ne besî me ne ku em bibêjin, Kurd Somerî ne yan Kurd ji Someriyan in . Li vê gorê jî ne durist e ku em bibêjin zimanê Kurdî paşmayekî zimanê Somerî ye!

**Zimanê Avistayî**

Bandora Avista û zimanê Avistayî li gelên herêmê û zimanên wan bûye.

Mes'ûd Mihemed der barê rola Avista de dibêje[1] :

"Çi tê gotin bila bê gotin, lê ya herî rast ew e ku bandora Avista ji hêla olî, rewşenbîrî û zimanî ve li gelên Arî bi giştî ron û eşkere ye. Wê bandorê heta destpêka Islamê jî berdewam kiriye."

Ew dema ku Zeradeşt tê de ji dayik bûye, bi hûrbînî nehatiye nasîn. Hinek dîroknas dibêjin, Zeradeşt di sedsala heftem ya BZ de bûye, hinek jî dibêjin, Zeradeşt di sedsala nehem ya BZ de hatiye dinyê. Bi rastî, çi belge li ber destê kesî nîne ku karibe bi hûrbînî wê demê destnîşan bike. Lê tiştê ku piraniya dîroknasan tekez kiriye ew e ku Zeradeşt li herêma bakûrê rojavayê Îranê ji dayik bûye. Anku, li herêma Mukriyan, başûrê Deryaceya Ormiyayê .

Li gora ku dîroknas tekez dikin, Zeradeşt ji welatê bav û kalên xwe berû herêma Xurasanê ve koçber bûye û li bajarê Belxê nîştecî bûye. Li wê herêmê dest bi belavkirina peyamên doz û xwazyariyên xwe kiriye. Avista jî li wê herêmê pêk hatiye.

Di vê pêvajoyê de mirov tûşî pirsekê dibe:

Gelo Avista bi zimanê Zeradeşt û bav û bapîrên wî hatiye nivîsîn, yan bi zimanê welatê koçberiyê yê ku lê jiyaye?!

Bi dîtina piraniya karnasên zimanên dêrîn, Avista bi zimanê Zeradeşt ê dayikê, zimanê welatê ku lê bûye û lê mezin bûye hatiye nivîsîn.

Bûbelata herî kambax ku bi ser Avista de hatiye ew zêdegaviya hovane bû, dema ku Îskenderê Makdonî sala 331'ê BZ pirtûkxana şahinşahî, li bajarê Istexirê[2] (paytexta ola Zeradeştî) şewitand. Piraniya bergên wê pirtûka pîroz şewitîn, tenê nêzî 83000 bêje ji wê şewatê rizgar bûne. Lê ya xoşbextane ew bû ku hemû deqqên (metnên) wê pirtûkê di sîngên Mûbîdanan[3] de parastî bûn . Bi vê yekê jî tiştek ji Avista winda nebûbû.

1 - مسعود محمد لغة الكرد – بغداد 1987 –ص14
Mes'ûd Mihemed : " Zimanê Kurd"
. Bexda (1987= . R. (14) -

2- Bajarekî kevin e, li ser kavilên bajarê "Parsî Polîs" hatiye avakirin. Demeke dirêj weku paytexta ola Zeradeştî maye .

3 -Mûbîdan : Pîrên ola Zeradeştî

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

# Helbestine Bijartî... Ebdulezîz Ferman (Can Salar)

**Bi peyv û bêjeyên nerm û fêmbar, riste û hevokine liherik û dagirtî dariştine. Çawa ku nexweşxaneya wî bûbû -û hêj jîhêlîneke hêmin û germ ji bo dermankirina birîndar û nexweşên kurdan, wisa jî qada helbestê jê re bûye lûtkeyeke berfireh li jora çiyayekî, pê ve hilkişiyaye, ya di dil de gotiye û bilind xwendiye.**
**Di helbesta Dr. Ebdulezîz Ferman (Can Salar) de, mirov bi dest xwe re gurbûn û germahiya evînê hîs dike. Mezinahiya temen, hîç bandora xwe li hest û evîna doktor nekiriye; belku bi mezinahiyê re berjortir çûye û gihaye pileyeke bilindtir.**
**Ji hêman û rêgezên helbestê wêdetir, gotareke xurt û hostane ku girêdan û welatperweriyeke pak nîşan dide, di helbesta Dr. Ferman de peyda dibe.**
**Welathezî, penabernebûn, wefadarî, serbilindî, şanazî, evîn û dilegermî... hêmanên bingehîn ên helbesta Dr. Ebdulezîz Ferman in.**
**Dengê gotareke wêrek di banga Dr. Ferman de tê bihîstin; rexnekirina tevgera siyasî, destnîşankirina xalên lawazî û jihevparçebûna gel û doza girêdana bi xakê ve vekirî tên gotin.**

### Porsipî

Porsipî me heftêsal im
Hêj bikêr im ne bêhal im
Ez ne pîr im ne jî kal im
Bo Sitêrê ez şepal im
Ji keçan re ez heval im
Ev daxwaza dilê min e
Wek derya ye, kûr bêbin e
Dîdara te tiştek din e
Ey nazika rind û delal
Ez ko mêr bim tu jî jin e
Ez pizîşk im ne betal im
Pir nexweş im, bê pergal im
Ji bir derdê evîna te
Şev û rojan her dinalim
Ne sergêj û ker û lal im
Şevên jivistan dirêj in
Were ta em hev bigvêşin
Xweşgotina ji hev re bêjin
Hingiv ji lêvan bimêjin
Ez bibim mêr, tu bibî jin.

### Mîna Te

Li cîhanê hemî geryam
Mîna te min nedîn dilsoz
Bi fermêz û keser giryam
Ji dil min derneket ev doz
Bijî ey şahsiwara min
Te payiz kir buhara min
Keça kurdî çeleng û naz
Di jînê de tu dara min
Çi qa pesnê te bêjim ez
Gunehkar her dimînim ez
Li ser taca key û dara
Te datînim bi naz û lez
Eger biryar bi dest min ba
Destê min jî ne wa kin ba
Li vê rewşa tesk û nexweş
Ez dibûm mêr tu jî jin ba
Wekî şêran çi jin, çi mêr
Evîna xwe biparêzin
Bi dilsozî evîndar bin
Bila em tim fedakar bin.

### Pakrewan

Çav zuha ye ji hêsran
Guh giran e ji qîran
Dil nexweş e ji derdan
Ser kuştiyên pakrewan
Azad nabin ne bi xwîn
Ev şax û bax û zemîn
Pêşmerge û YPGê
Weke şêran li cengê
Destê hev nema berdin
Kurê Kawa tev kurd in
Di mêjû de her zind in
Cengewar û hem merd in
Bijî yekîtiya kurdan
Azadî û serhildan
Aşitî û berxwdan
Bijî bijî Kurdistan.

### Jiyana Min

Jiyana min çewt û xwar e
Geh li jor e geh li xwar e
Wek dilê min bêbuhar e
Havîna min şil û sar e
Ci jiyan e tê de dijîm
Şev û rojan her dem digrîm
Bê heval û dost û yar im
Tev di dil de tim wek ar im
Ji min nepirs çima wa me
Dilê bitirs tim wek cam e
Bi yek pirsê tê şikandin
Bi peyvek xweş wek şimam e
Geh wek Kawa qehreman im
Roja cengê ez Ferman im
Geh wek Şemşonê Cebar im
Geh bê lep im, bê neçar im
Rewşa min û vî welatî
Weke pêlê ava derya
Geh hilatî, geh dahatî
Kûr di bin de pir in çiya
Ez im çiyayê şaxê Toros
Ji destpêkê bûm Amanos
Xwedî şal û şap û kiras
Tim li serê m' kum û kolos
Ne pêxwas bûm weke hina
Ne çete bûm wek yê dina
Mêr û comerd navê min e
Şax û çiyayê m' bi kok û bin e.

### Li Ser Navê Te

Li min bibûre bira Zinawer (1)
Dilê xwe megre, ji min bib bawer
Tiştê bi navê te ku min dikir
Kesê biol be, pê dibe gawir
Li şûna bi hev re bikin giftûgo
Ez diçûme cem dosta roja do
Derdê dilê xwe min pê xweş dikir
Lê ar li canê m' bêtir dibû gur
Derdê evînê har û dijwar e
Wek derdê welat li min siwar e
Her dû ji bo min êşek xedar e
Rê jê dernaxim, mame bêçare
Li ser navê te min xwe didizî
Bi hestê dilê min keçê nelîzî
Nav û dengê min her kes dibhîzî
Eger mezin bim ti jî ne qîz î
Tirk û laz û furs ew kesên ebîd
Li ser sînga te tev dikin cirîd
Kurdên ciwanmêr mêrxasên ji mîd
Mixabe, bê war mane ev egîd
Kesek nizane derdê dilê min
Pir in wek çiya êş û kulê min
Ji hev dernaxin ev dost û hogir
Barek pir giran dan ser milê min
Sûndê ez dixwim bi çavê yarê
Ji vê danayêm li jînê vê carê
Ez bimrim, bimînim li vê jiyanê
Bi kes we nadim te û Kurdistanê.
(1) Zinawer: Zinawerê Haco ye. Ev helbest jê re diyarî ye.

### Tu Ya Dawî

Ciwanî! Ka berê xwe tu bide min
Çi xweşî… min ji dîtin ciwanî
Pîrî êrîş daye can û ser û laş
Belam wekî her kes dilê m' hêj jî ciwan î
Heval û hogira pişta xwe dan min
Dixwazin min bikin dîlê zemanî
Nizanin ku di sînga min de pêtek
Dike ronî wekî roj û hetawa asimanî
Bi dost û yar temen min tev de bûrand
Bi roj û şev bi naz û lav seraser ta beyanî
Tu ya dawî! Tu ya pêşî! Çi zanim
Li dawî kes li şûna te nedanî
Ji min gazin meke ey dilbera min
Te rêçek nuh ji bo xwe dît û anî
Cihê gazina di dil de qet nemane
Hemû bûye birîn û kul ji wan tîrên kevanî.

### Êdî Bes e

Gelek şevê reş û tarî
Me bûrandin bi diljarî
Pirsgirêk û qeyran me dîn
Dîsa em man li vî warî
Me baz neda ji nîştiman
Me rê neda wan dijminan
Çima îro xortên çeleng
Ji xaka xwe teva berdan
Wa pêşmerge li serê çiyan
Ala sê rengînî hildan
Li sengerê şer û xebat
Diparêzin xaka welat
Doza serxwebûnê dikin
Li van rojan demek pir kin
Navê kurdan li nav netewan
Bi serbilind belav dikin
Xwe nedin paş ji xebatê
Cotê xwe bib serê latê
Nêvcî nehêl vê armancê
Bê evîn û bê dilber
Te ji bo kê tev de berda
Ey hevalê penaber
Bibî pêşmerge li şaxan
Canfîda bona welat
Serbilind û her birûmet




### Hevalê Penaber

Te ji kê re tev de berdan
Xan û mal û ev dever
Heta doh tu pehlewan bû
Lê îro mayî bê mefer
Çalakvan û mêr û gernas
Va ditirsî û bê ceger
Xwe li sînoran didî
Weke xwînî diçî der
Ta bibî sêwî li şaran
Çi parsek! Çi penaber
Qada medanê te berda
Bê lêdan û ceng û şer
Ku ji xaka xwe tu berdî
Ev e çûna bêveger
Ev riya bazdan û revê
Riya qelsên xulîliser
Pir kirêt e kurê Rustem
Wer li serê xwe bikî
Bibî mêvan li welatan
Bê rûmet û bê hiner
Nîştiman bûka cihan e
Va te xist destê neyar
Ka ji bo çi êdî ev jîn
Dibî nîşana xebat.

### Nema Bigrîn

Li ser miriyan nema bigrîn
Bi saxî va her roj dimrin
Kur û keç û biçûk û jin
Ji xan û mal bi kom diçin
Ji xaka we, hûn derxistin
Neyarên kurd, ev dixwstin
Gund û bajar tev vala bûn
Ev çi doz in? Çi mebest in?
Rawêjkarê me ka kî ye?
Lêvegera me ka çi ye?
Ev partiyên nayên jimar
Em xistin nav lepê keftar
Rabin li hev zû bicivin
Ji qada şer bes birevin
Ji bin xeyalan derkevin
Ji doza xwe danekevin
Çikin îro ji giryanê
Ji Dêrikê ta Kobanê
Seranser ceng û lêdan e
Xweş guh bidin vê fermanê
Eger hat û me tişt nekir
Bi dest nexist û maf nebir
Gazinda dê ji kê bikin
Dem hat, lê em man bê zikir
Dem hat û çû, em man sifir.

### Em Gihan

Em gihan ku bibne dewlet
Lê ji dest me tev de derket
Em bi şerê hev daketin
Tirên meşî û ti jê daket
Berî sed salî me wa ker
Li ber çavên min e encam
Em ji hev re tev de şêr in
Ji xelkê re wekî xulam
Ger ji mêjû em nebin fêr
Bi par nemîn ji xelatê
Şerê hevdû êdî bes e
Nema bikin pise pis e
Kurdistana Başûr hels e
Azadî ye bo her kes e
Ev bû sedsal her Berzan in
Navnîşana nîştiman in
Mam û Apo li gel wan in
Milet hemî fîdacan in.

### Nêçîrvan

Gava bighê hestî ve kêr
Em tev diçin li ber lingan
Biçûk û kal, hem mê û nêr
Va ye noker tev gihan hev
Bi bazdan û bi lez û rev
Bi dest nayê her roj derfet
Ji dîrokê bigrin ibret
Nav li me kin, çi go nav be
Bela bê xwê û hem xav be
Tenê îro bibin azad
Dar geş û şîn û bi av be.

### Civan

Dilberê rindê delalê
Nazik û şox û şepalê
Şekirê şêrînhevalê
Bersiva xweş da sûalê
Bi têlê da min civanek
Dil ji min bir tev bi carek
Xew li min çû ta beyanî
Li ber mi' danî nûjiyanek
Têgihiştî şox û şeng e
Pozbilind mîna piling e
Hogira aştî û ceng e
Bi xebatê hem pêşmerge
Her bijî keça welat im
Ez di vê rê de xelt im
Şev û rojan bilebat im
Ez li gel ten û hilat im
Xwendevana min ciwan e
Zîrek û hişyar û zane
Netewî barek giran e
Lê li gel wê pir hesan e
Ey hevala dil û jînê
Dermanê dax û birînê
Sed sipas bo her civînê
Ez bibim Mem tu bî Zînê.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683

bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

## Kultûrname

**DILQÊ MEDRESEYA KURDÎ DI WÊJEYA KURDÎ DE - 6**

**Zeynulabidîn Zinar**

Di nava Kurdan de, bê guman diviya ku ji her malbatekê yek an du zarok bi Xwendina Medreseyê perwerde bibûna. Çi kesê ku bixwenda, heta ku medrese diqedand, di navbera 80 û 100 pirtûkî de bi dersîtî dixwend. Ji wan 15-20 pirtûkên kurdî û du-sê pirtûkên farisî ne tê de, yên din tev bi zimanê erebî bûn. Dema dersdar ders dida şagirdên xwe, hew qas pirtûkên bi zimanê erebî werdigerandin zimanê kurdî. Bi vê yekê hem dersdar û hem jî şagird, mecbûr diman ku peyv û hevokên kurdî ku bersiva peyv û hevokên erebî didin di wergerandinê de peyda bikin. Ev hawe zorî dida ku hem dersdar û hem jî şagird hem di zimanê erebî de û hem jî di zimanê kurdî de berepêş herin.

Di wergerandina zimanê erebî bi zimanê kurdî de, zehmetiya dersdarên Medreseya Kurdî nebû. Ji ber ku ew kultûra sedsale ya medreseyê wisa riya wergerandinê bo wan hêsan kiribû ku heta wergerandina Felsefeya Yûnanî jî pir bi hêsanî bi zimanê kurdî dikirin.

Hin caran eger li medreseyekê kêmasiyek di wergerandinê de derketiba, li herêmê kîjan dersdarê bi nav û deng hebûya, alîkarî jê dihate xwestin û naveroka wê babeta ku nehatiye zanîn çareser dikirin.

Jixwe di Medreseya Kurdî de şaxekî xwendinê hebû ku jê re ”Edeba Behsê” ango uslûba axaftinê dihate gotin. Yanî piştî ku xwendina medreseyê kuta bibe, ev kes dê çawa bipeyive û awayê axaftinê ji bo her naverokekê çewa dê çêbibe bi dersîtî dihate xwendin. Vê yekê jî tesîreke mezin li bipêşxistina zimanê kurdî dikir. Ev haweyê uslûba axaftinê, dersdarên medreseyê gelek caran di rojên înan de li mizgevtê ji xelkê re jî digotin ku divê axaftina mirov nerm be û peyvên sik û hişk neyêtin bikaranîn. Wek mînak: ”Bavê min di zemanê xwe de dersdarekî xuyanî bûye. Di salên 1959-60’î de, min dîtiye ku heta 70-80 feqeyan jî li ba wî dixwend. Hin caran dema ku gundiyan şer dikir û ji hev zivêr dibûn, dijûnên pir xirab bi hevûdu dikirin. Bavê min roja înê weha digote wan: ”Di şûna ku tu ji yekî re bêjî (biborin) kurê kerê, bêje kurê nemirovan. Hingê ew yek zêde zivêr nabe û dijûnê li te jî venagerîne. Di navbera we de ne şer çêdibe û ne jî xirabî…”

## Berhemên Nû

### Di Encama Xebateke Hevbeş de... “Waneyên Rêzimana Kurmancî” li Qamişloyê Hat Çapkirin




Cara pêşîn e ku li bajarê Qamişloyê, di ecnama xebateke hevbeş de pirtûkeke rêzimanî tê berhemdan. M. Ferhad Mûsa, M. Izedîn Mihemd û M. Rêzan Hemo ku her sê jî endamên Saziya Zimanê Kurdî ne, piştî xebateke hevbeş pirtûka “Waneyên Rêzimana Kurmancî” amade kir û di 10’ê hezîrana 2018’ê de pirtûka wan bi çapeke taybet li Herêma Cizîrê hat weşandin.

Babetên ku di “Waneyên Rêzimana Kurmancî” de ne, bi awayekî akademîk hatine rêzkirin û şîrove û pênasekirinên wê jî bi zimanekî fêmbar û nerm hatine nivîsîn. Rast e ku ev pirtûk ji bo mamosteyên Rêveberiya Xweser hatiy amadekirin, lê belê fêrkereke kêrhatî ye û mirovê ku bixwîne dikare xwe bi xwe rêgezên wê bigire. Di pêşgotina xwe de amadekarên pirtûkê daye zanîn ku wan xwe ji xalên dubend û nakok vedaye û tenê rêgezên rûnîştî girtine dest. Tişta herî balkêş jî di vê berhemê ew e ku mînakên di şîrovekirinê de hatine rêzkirin, ji parçeyên zargotina kurdî û ji berhemên wêjevanên kurd in.

## Gotinên Pêşiyan

- Koda zêrîn çûye bi dû kevçiyê darîn ketiye.
- An bike û nepirse an jî neke û netirse.
- Aş ji du keviran û hevaltî ji du biran.
- Felek ku ji yekî re li hev bîne nabêje tu kurê kê yî.
- Hindik hindik dê bigihe gundik.
- Kar bike bi bingehî da li ber te nebe lehî.
- Mala pîro xweştir e ji mala mîro.
- Ji zivistanê heta havînê sed kum bê xwedî dimînin.
- Baran ji ewrê reş tê û kar ji dilê xweş tê.
- Çek ne ya hemû kesî ye le nefs ya hemû kesî ye.
- Dan çi qas bikele nabe birinc.

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | | | ■ | | |
| 2 | | ■ | | | ■ | | | ■ | |
| 3 | | | | | | | ■ | | |
| 4 | | ■ | | | | | | | |
| 5 | | | | | ■ | | | ■ | ■ |
| 6 | | | | ■ | | ■ | | | |
| 7 | ■ | | ■ | | | | ■ | | |
| 8 | | ■ | | | | ■ | | ■ | |
| 9 | | | | ■ | | | | | |

**Sitûnî**

1- Bajarê Êlihê bi tirkî – Cînavkeke pirjimar.
2- Dijwateya “neman”ê.
3- Qeytan belavkirî – Du tîpên wekhev.
4- Giyan – Dijwateya “nema”.
5- Ap – Nazê belavkirî.
6- Dijwateya sitûr.
7- Madeya ku mast jê çêdibe – Du tîpên wekhev.
8- Dîn (ayîn) – Cînavkeke kesane.
9- Çemekî li ser sînorê Kurdistanê.

**ASOYÎ**

1- Paytexta Libnanê – Cînavkeke Kesane.
2- Du tîpên wekhev – Cînavkeke kesane.
3- Bajarekî nêzîkî Gola Wanê – Nêzwateya “ax”a baneşanê.
4- Bajarekî Rojavayê Kurdistanê.
5- Firax – Cînavkeke pirsyarî.
6- Ji arvan e, xwarina rojane ye – Mar belavkirî.
7- Dayîk – Di peyva “bêjer” de qertafa sazker.
8- Xwarina rojane.
9- Dijwateya “neman”ê – Bajarekî Bakurê Kurdistanê (Vajî).

**Amadekarê xaçepirsê: Îsa Bavê Siwar**

## Sitêrname 15

**Narîn Omer**

Hunermenda dengxweş Tara Caf, di sala 1958’an de li Bexdaya paytexta Iraqê hembêza dayîka xwe pîroz kiriye, lê malbata wê bi xwe ji Helepçayê ye. Lê belê tu caran ji warê xwe qut nebûye û her timî seredana Helepçayê kiriye, her wiha sitranek jî li serê gotiye.

Ji ber ku dêya wê turkmen bû, di destpêkê de ne bi kurdî ne jî bi erebî gelekî nedizanî, lê belê paşê xwe baş fêrî kurdî kir.

Di sala 1976’an de bi malbata xwe re li pêlên biyaniyê siwar dibe û li Brîtanyayê bi cih dibe.

Malbata hunermend Tara pir ji muzîkê hez dikir û li piraniya cureyên sitranan ên kurdî, erebî, turkmenî û ingilîzî guhdar dikir. Ji lew re evîna saz û muzîkê dilê wê girt û berê xwe da awazjeniyê. Hunermenda me di vê biwarê de wisa dibêje:

“Ez di asoyên malbateke hunerhez de xwedî bûme. Li ser dengê sitranbêjên mezin, bi sitranên klasîk û nûjen û li ser meqamên resen mezin bûme...”

Her wiha dibêje:

“Dê û bavê min guh da xwişka min a ji min mezintir û piştre ew bû sazvana amûra piyanoyê.”

Li ser hezkirina wê ji gîtarê re, hunermenda me dibêje:

“Dema ku di dibistanê de me seredana Muzexaneya Iraqê kir, çavên min li gîtarê ketin. Hezkirina gîtarê bi dest xwe re kete dilê min û hestên min hejandin. Ez li dora wê zîvirîm, wekî ku di cîhanên cadûyî de bigerim û negihêjim rastiya wê. Bavê min di Wezareta Derve ya Iraqî de kar dikir û gelek caran seredana welatên Ewrupayê dikir, ji ber vê hindê ez li ser muzîka rojavayî xwedî bûme û min baş bi muzîkê dizanî. Ji wê kîlîkê ve hezkirina gîtarê di dilê min de mezin bû û şaxên xwe kûr berdan.”

Der barê danasîna gîtarê de, wisa pêzanînên xwe tîne zimên:

“Gîtar ji amûrên ceng, nêçirvanî û segvaniyê hatiye daristin. Em ê hizir bikin ku mirovekî hestnazik li ser rewiştên nêçîr, segvanî û cengê fêr bûye û di kûrbûna hestên xwe de xwestekan dirêse ku ew ji herikandina xwînê û ji kuştinê bireve, bi dûr bikeve; ev kesê bêzarmayî teştekî li pêş xwe nabîne ji bilî ku têlên kevanan bişidîne û sist bike, bi vî awayî awazên oldarî dibihîze û bi çend hewildanan awazên nazik û hestyar pê re derdikevin ku li ser peyama canê wî diaxifin.”

Hewildanên wê di warê jenandina amûrên: mandolîn, granko û bizqa kurdî hene, lê hezkirina wê ji gîtarê re bêdawî ye.

Tara xwendina xwe ya akademiyê nadomîne û dixwaze xwe bi xwe hînî muzîkê bibe. Lê belê wê yekê tekez dibêje ku xalê wê Nedîm Dîmêrêl bandoreke mezin lê kiriye; ji ber ku ewî ew fêrî lêxistina gîtarê bi destê rastê û şêwazê flamenkoyê kiriye.

Zaravayê hewramî ku di roja îroyîn de hejmareke gelekî kêm ji hunermendan pê disitrîne (cotyar û karkerên hewramî jî sitranên folklorî yên hewramî dibêjin), hunermenda me bi vî zaravayî

## Tara Caf... Gîtara Hunerê

hunera xwe pêşkêş dike, ji ber ku ev şîreta bavê wê ye. Bi vê yekê diyar dibe ku çi qasî hunermend Tara dilsoz û wefadara doz û xaka xwe ye.

Dema ku mirov li dengê Tara guhdar dike, mirov hizir dike ku dengê wê û gîtarê bûne yek deng û bi hestekî nazik avjeniyeke kûr dikin.

Tara dixwaze ku ji gelên cîhanê re huner û saza gelê xwe bide nasîn, ew jî bi rêya beşdarbûna di aheng û festîvalên cîhanî û herêmî de li Ewrupa û Amerîkayê. Ne tenê wisa, lê belê bi dengê xwe alîkariya dezgehên civakî û xêrxwazî dike.

Em qevdên xweziyan di bîroka wê de diçînin ku bi hemî zaravayên zimanê xwe bisitrîne, da ku deng û saza wê bigihe tevahiya kurdên me li seranserî deverên cîhanê. Ji ber ku dê cihê mixabiniyê be eger ev deng û behre belav nebin û derbasî hest û hizrên gel nebin.

Hunermenda me çend albom û kaset belav kirine û di kar û xebata xwe ya hunerî de hêj berdewam e. Em hêvîdar in ku ew her dem serkeftî û dengxweş bimîne, ji ber ku karê wê yê herî girîng û pîroz e.

## Peyva Windayî

**Da ku tu peyva windayî bibînî, peyvên jêrîn xêz bike:**

MÊKEW - PAKISTAN - BÊNDER - BÊRÎVAN - MAST - BEXTEWARÎ - BEYLÛTE QULING - LALEŞ - RÊBER - SIST- BAHOZ - HÊLÎN - ÇÎROKBÊJ - BAZ - ASÊ - VEBÛN - ALASTIN - DEST - NEWROZ.

**Peyva windayî ji 8 tîpan pêk tê, ew jî navê wî mirovî ye yê ku canê xwe dike bi goriya doza xwe.**

| | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| B | A | H | O | Z | B | Ê | N | D | E | R | K |
| B | Ê | R | Î | V | A | N | E | D | E | S | T |
| Q | U | L | I | N | G | A | L | A | L | E | Ş |
| N | N | E | W | R | O | Z | R | Ê | B | E | R |
| P | A | K | I | S | T | A | N | M | A | S | T |
| H | Ê | L | Î | N | W | M | Ê | K | E | W | P |
| B | E | X | T | E | W | A | R | Î | B | A | Z |
| A | S | Ê | R | Ç | Î | R | O | K | B | Ê | J |
| V | E | B | Û | N | A | L | A | S | T | I | N |
| S | I | S | T | A | B | E | Y | L | Û | T | E |

## Bersiva Xaçepirsa Hejmara Çûyî

| | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| B | A | H | O | Z | B | Ê | N | D | E | R | K |
| B | Ê | R | Î | V | A | N | E | D | E | S | T |
| Q | U | L | I | N | G | A | L | A | L | E | Ş |
| N | N | E | W | R | O | Z | R | Ê | B | E | R |
| P | A | K | I | S | T | A | N | M | A | S | T |
| H | Ê | L | Î | N | W | M | Ê | K | E | W | P |
| B | E | X | T | E | W | A | R | Î | B | A | Z |
| A | S | Ê | R | Ç | Î | R | O | K | B | Ê | J |
| V | E | B | Û | N | A | L | A | S | T | I | N |
| S | I | S | T | A | B | E | Y | L | Û | T | E |